

## **Kurmancî û soranî: Du zarave yan du zimanên cuda ?**

Elî Paksirêşt

**Ziman:** Mirov bi asayî raman, bîr û bawerî, hest, vîn û xwestekên xwe bi zimên beyan dike ku bi du awayên devkî û nivîskî ne. Ew bi hevokan dirame û diaxive. Hevok jî koma wan peyvvan e ku bi awayên rast ên rêzimanî û mantiqî li kêleka hevdu bin heya ku bikaribin wateyeka durist pêk bînin. Ev yek jî yekîneyeka zimanî çêdike.

Mînak:

Rizgar rêzefîlman dinihêre. (Hevok e, ji ber ku hem ji hêla rêzimanî va him jî mantiqî va rast e).

Balafirê Rizgar xwar. (Hevok e lê ne rast e, ji ber ku tenê ji hêla rêzimanî va rast e û ji hêla mantiqî van e rast e. Balafir mirovan naxwe)

### **Ziman û nêrînên heyî:**

1-Nêrîna rêzimanîyê: Rêziman zimên ew cureyî ku divê bibe lêvedikole û lêhûrbînê li ser dike. Rast û nerastbûna wê tîne ber çav. Ji bo vê yekê jî, berhemên klasîk, zargotinî (folklore) wekî bingeh digire. Ji ber rewşa taybet a li ser zaraveyên zimanên kurdî, nêrîna rêzimanî baştir e û pêşiya têkçûna zimên û mudaxileyên nebaş digire.

Mînak:

Serokwezîr îmza xwe avêt. Ev pey bi peyv ji tirkî hatiye wergerandin bêyî ku bingeha zimanê armanc (Kurdiya kurmanciyê) ber çav bigire.

Di kurdiyê da, mirov kevir, kuçik, ... diavêje, ne îmzeyan. Îmzekirin an jî wajûkirin durist e.

Hevoka yekem ne rast e. Ji ber ku wergera peyv bi peyv ji tirkî ye. Rêziman li gorî çavkaniyên klasîk îsbat dike ku kurdiya wê ya rastîn ev e:

Serokwezîr îmze kir / Serokwezîr wajû kir.

2-Nêrîna zimannasiyê: Zimannasî zimên ew cureyî ku heye dinirxîne û li ser lêkolînan dike.

**Rêziman:** Lêkolîna pergaliya beşên ku zimanekî çêdikin ra rêziman dibêjin ku bixwe jî dibe çend beşên jêrîn:

a-Avanasî yan zanista avayên (dengên) zimanekî (phonetics).

b-Peyvnasî yan zanista peyvan (lexicology).

c-Zagonên rêzepeyvan yan koma zagonên li bara rol û peywendiyên peyvan di hevokê da (syntaxe).

Peyvnasî bixwe jî dibe çend beşên wekî rîxtnasî (morphology), bilêvkerin, rênivîs (ortography), rîşenasî (etymology), watenasî (Semantics).

Mirov dikare li bara mijarên jorîn yeko yeko pirtûkan binivîse û riya bipêşveçûnên rastîn ên zimanî ji bo zimanên kurdî vebike, wê demê rastî ji hestiyariyê dûr dikeve û tê holê. Wê dem mirov dikare bibêje ka zimanek çiqasî dewlemend e yan na.

Ev demek e ku li bara zimanê pîvankî, yekbûna alfabê, fermîtî û nefermîtîyê, dijberiya axêverên hin zaraveyan hember hin ên din, ... tenûr germ e û hin nîqaş tîn kirin. Ev yek bû hokarekê ku ez ji xwe bipirsim gelo kurdî ziman e ? Gelo kurmancî û soranî her du jî kurdî ne ? Gelo kurmancî û soranî du zimanên cuda ne ? ...

Ez li ser vê pîrsa dawîn rawestiyam ji bo ku bibêjim eger her du zaraveyên zimanekî ne (rewşa wan a heyî ne ya berî hezaran sal), pes pêwîst e alfabêyeka yekgirtî ji bo wan wekî zimanekî yek hebe, eger du zimanên cuda ne, pêwîst nake li ser yekbûna alfabê nîqaş bibin. Wê demê divê kurmancî jî wekî zimanê tikemenan, asûriyan, ... li Kurdistana Iraqê bê nasîn û qedexeya li ser wî bê rakirin. Em ê vê yekê bi awayekî zanistî bi hevdu ra bikolin û di dawiyê da wekî dadwerekî encamê bigirin.

## **Cudayên zimanî yên kurmancî û soranî**

1- Zayenda peyvan

Di kurmanciyê da her peyvek an mê ye yan jî nêr. Ev taybetmendî di gelek zimanên din wekî fransî da jî heye.

Mal: Ev malê min e (These are my properties / Ev darayiya min e, pereyên min in, ...)/(nêr).

Ev mala min e (This is my house/home / Ev xanî / derbanê min e)/(mê).

Di Soranî da wekî farisî mê û nêrbûna peyvan tune.

## 2- Cînavên kirde

Di kurmanciyê da ji bo piraniya demên niha û bê cînavên kirde yê xwerû (ez, tu, ew, em, hûn, ew(an) tên û sa piraniya demên borî yê tewandî(min. te, wî, wê, me. we, wan bi kar tên.

Kurmancî: Ez dibînim. Min dît.

Soranî: Min debînim. Min bînim.

Di Soranî da ji bo hemû deman (min, to, ew, ême, êwe, ewan) bi kar tên.

## 3- Dem

Hem hejmar û him jî bîngeha deman di kurmanciyê û soranî da ji hevdu cuda ye.

Mînak:

Dema bê di kurmanciyê da wiha çêdibe (navdêr/ cînavkê kirde + ê/yê/dê + bi+rîşeya lêker+paşpirtik

Kurmancî:

Ez ê/dê bi kurdî binivîsim, tu yê/dê bi kurdî binivîsî, Ew yê/dê bi kurdî binivîse, em ê/dê bi kurdî binivîsin, hûn ê/dê bi kurdî binivîsin, ew(an) ê/dê bi kurdî binivîsin (Dema bê).

Ez bi kurdî dinivîsim, tu bi kurdî dinivîsî, ew bi kurdî dinivîse, em bi kurdî dinivîsin, hûn bi kurdî dinivîsin, ew(an) bi kurdî dinivîsin (dema niha).

Soranî:

Min kurdî denûsim, to kurdî denûsî, ew kurdî denûsê, ême kurdî denûsîn, êwe kurdî denûsin, ewan kurdî denûsin (dema bê).

Min kurdî denûsim, to kurdî denûsî, ew kurdî denûsê, ême kurdî denûsîn, êwe kurdî denûsin, ewan kurdî denûsin (dema niha).

Ev hem dema niha him jî dema bê ye, yanê her du dem di soraniyê da bi awayekî ne. Cîvakên kirde, rîşa lêker, pêşpirtik, paşpirtik gişt ji hevdu cuda ne.

#### 4- Zincîra hevnişîniyê

Di her zimanekî da peyv li gor qanûneka taybet li rex hevdu radiwestin û eger wisan nebe hevok durist nabe.

Mînak: I always ask them to speak Kurdish at home. (Ez herdem ji wan dixwazim di mala xwe da bi kurdî biaxivin).

Zincîra hevnişîniyê ya herî xwerû ya inglîsî di vê hevokê da ev e:

Cînav (navdêr) + hokera dubare + lêker + têrker + hokera awa + cih + hokera dem

Eger mirov bibêje: to speak at home ask I them always.

Ev ne rast e, ji ber ku ji dû hev rêzbûna peyvan divê li gor zagonên zincîra hevnişîniyê ya inglîsî be û tenê hevoka yekem durist e.

Ev zincîr di hemû zimanan da wekhev niye û nîşaneka cudayiya zimanan e.

Fransî : Je leur ai demandé de parler Kurde chez eux. (Kurmancî: Min ji wan xwest di mala xwe da bi kurdî biavivin / Soranî: Min dawam lewan lêkirdin le malewe bi kurdî qise bikin)

Zincîra hevnişîniyê ya herî xwerû ya fransî di vê hevokê da ev e:

Navdêr (cînavk) + têrker neyekser + lêker + têrkera yekser + hokera cih

Ev zincîr, wekî di hevokên jorîn da jî diyar e, di kurmanciyê û soranî da jî ji hevdu cuda ne).

Minakeke din:

Ez herdem ji wan daxwaz dikim li mala xwe da bi kurdî biaxivin.

Cînavka kirde + hokera dem + daçek + cînavka têrker + lêker + hokera cih + lêkera kesandî ya duduyan.

Emin pêyan delên hemîşe le maliyan digel mindalekaniyan kurdî qise bikin.

Cînavka kirde + daçek û cînavka têrker + lêker + hokera dem + hokera cih + daçek + têrker + lêkera duduyan.

5- Diyar û nediyar (Passive and active voices)

Ez pirtûkê dixwînim (diyar). (I read the book. / Je lis le livre.)

Pirtûk tê xwendin (nediyar). (The book is read. / Le livre est lu.)

Min pirtûkekê dexwênimewe (diyar). (I read the book. / Je lis le livre.)

Pirtûk dexwêndirêtewe (nediyar). (The book is read. / Le livre est lu.)

### **Encam ;**

Ne kurmancî ji soraniyê sertir e ne jî soranî ji kurmanciyê. Her du jî di cihê xwe da xwedî rêz in. Her du jî du zimanên cuda ne lê bingeh û çavkaniya wan yek e (wekî digel farisî). Sepandina tiştekî bi navê zimanê yekgirtî ne zanistî û ne ye jî li gorî dilê gelê kurd e. Bi cihê qexekirina perwerdeya kurmancî li Kurdistanê Iraqê divê riya pêşveçûna wê vebibe.